



Mukaddime

Feqiyê Teyran Divanı'nda Ölüm ve Özellikleri

Osman Aslanoğlu

ORCID: [0000-0001-6534-3125](https://orcid.org/0000-0001-6534-3125) | aslanogluosman@gmail.com

Prof. Dr., Dicle Üniversitesi, S.K. Edebiyat Fakültesi, Doğu Dilleri ve Edebiyatları
Bölümü

ROR ID: <https://ror.org/0257dtg16>

Öz

Ölüm fikri, birçok inançta temel bir konudur. İslam da diğer dinler gibi bu konu üzerinde çokça durmaktadır. Konunun bu öneminden dolayı dini şahsiyetler yönlerini öbür dünyaya döner ve aleme bu nazarla bakarlar. Ölüm fikri insanlar için korkutucu olsa da, özellikle tasavvuf ehli için Allah muhabbeti ve sevgisiyle ölmek bir amaçtır; onlara keyif verir ve bu ölüm fedakarlık ile sevginin bir nişanesidir. Edebiyatta da şairler en çok sevgili yolundaki acıdan ve ölümden bahsederler. Yar yolundaki fedakarlık en önemli şeydir. Canan için kendi canından geçmek bir amaçtır. Şairler bu sevgiyi göstermek için kendi nefsinden, ruhundan, bedeninden, canından ve varlığından vazgeçmekten bahsederler. Çalışmamızın konusu olan Feqiyê Teyran da divanında diğer şairler gibi ölümden ve yar uğruna feda olmaktan çokça bahseder, bu konuda pek çok teşbih kullanır ve ölümün farklı yönleri üzerinde durur. Divanın her yerinde bu konu göze çarpmaktadır. Ancak biz çalışmamızı bazı belirgin kelime ve kavramlarla sınırlandırdık ve bu kelimeler etrafında Feqî'nin gözünde ölümün yönlerini ortaya çıkardık. Bu çalışmayla Feqî'nin ölümle ilgili temel kavramlar üzerinde durduğunu, İslami ve tasavvufi unsur ile sembolleri çokça kullandığını görmekteyiz.

Anahtar Kelimeler: Şiir, Klasik, Fakiyi Teyran, Divan, Ölüm.

Atıf Bilgisi (APA 6):

Aslanoğlu, O. (2026). Di Dîwana Feqiyê Teyran da Mirin û Taybetîyên wê. *Mukaddime*, 17(Özel Sayı 1), 244-261.

<https://doi.org/10.19059/mukaddime.1930122>

Makale Geliş Tarihi: 14.04.2026

Makale Kabul Tarihi: 01.05.2026

Death and Its Characteristics in the Divan of Feqîyê Teyran

Osman Aslanoğlu

ORCID: [0000-0001-6534-3125](https://orcid.org/0000-0001-6534-3125) | aslanoğluosman@gmail.com

Prof. Dr., Dicle University, S.K. Faculty of Letters, Department of Eastern Languages and Literature

ROR ID: <https://ror.org/0257dtg16>

Abstract

The concept of death occupies a central place in many belief systems. Like other religions, Islam places significant emphasis on this subject. Because of its importance, religious figures direct their attention toward the hereafter and interpret the world from this perspective. Although the idea of death is often perceived as frightening, particularly for Sufis, dying out of love and devotion to God is regarded as a noble aspiration. It brings spiritual fulfillment and represents a symbol of sacrifice and sincere love. Likewise, in literature, poets frequently dwell on the pain and death endured for the sake of the beloved. Self-sacrifice on the path of the beloved constitutes one of the highest ideals, and relinquishing one's own life for the beloved is considered the ultimate expression of devotion. To convey this profound love, poets often speak of renouncing their ego, soul, body, life, and very existence. Like many classical poets, Feqîyê Teyran, the subject of this study, frequently addresses death and self-sacrifice for the beloved in his Dîwan. He employs numerous metaphors and similes to portray different dimensions of death, making this theme one of the most prominent throughout his work. However, this study is limited to selected key concepts and terms through which Feqîyê Teyran's perception of death is examined. The findings demonstrate that Feqîyê Teyran emphasizes fundamental concepts related to death while extensively employing Islamic and Sufi motifs and symbols to articulate his understanding of mortality.

Keywords: Fakiyî Teyran, Divan, Death, Poem, Classic

Citation (APA 6):

Aslanoğlu, O. (2026). Di Dîwana Feqîyê Teyran da Mirin û Taybetîyên wê. *Mukaddime, 17(Special Issue 1)*, 244-261.
<https://doi.org/10.19059/mukaddime.1930122>

Article Date of Submission: 14.04.2026

Article Date of Acceptance: 01.05.2026

Mirin û Taybetîyên Wê di Dîwana Feqîyê Teyran de

Osman Aslanoğlu

ORCID: [0000-0001-6534-3125](https://orcid.org/0000-0001-6534-3125) | aslanogluosman@gmail.com

Prof. Dr., Dicle Üniversitesi, S.K. Edebiyat Fakültesi, Doğu Dilleri ve Edebiyatları
Bölümü

ROR ID: <https://ror.org/0257dtg16>

Kurte

Fikra mirinê di gelek bawerîyan da mijareke bingehîn e. Îslam jî wek dinên din li ser vê mijarê gelek disekine. Ji ber vê giringîya mijarê, kesayetên dînî berê xwe didin dinyaya din û li alemê bi vê nêrînê dinirxînin. Fikra mirinê jî bo mirovan tirsnaq be jî bi taybet bo ehle tesewwûfê mirina bi muhebbet û hezkirina Xwedê amanc e, kêf dide wan û ev mirin nişana fedakarî û hezkirinê ye. Di wêjeyê da jî helbestvan herî zêde behsa êş û mirina di rêya hezkirîyê da dikin. Fedakarîya di rêya yarê da tiştê herî giring e. Derbasbûna ji canê xwe bo canan amanc e. Helbestvan bo nişandana vê hezkirinê, behsa fedakarîya ji nefsa xwe, rûhê xwe, bedena xwe, can û hebûna xwe dikin. Mijara xebata me Feqîyê Teyran jî di dîwana xwe da wek helbestvanên din gelek behsa mirin û fedabûna bo yarê dike, li ser vê mijarê gelek şibandinan bi kar tîne û li ser aliyên cuda yên mirinê disekine. Di her dera dîwanê da ev mijar bi ber çavan dikeve. Lê me xebata xwe bi hin bêje û têgehên berbiçav ve sînordar kir û li dor wan bêjeyan aliyên mirinê di çavê Feqî da derxistin holê. Bi vê xebatê em dibînin ku Feqî li ser têgehên bingehîn ên bi mirinê ra têkildar rawestîyaye, unsûr û sembolên îslamî û tesewwûfî gelek bi kar anîne.

Kilîtbêje: Helbest, Klasîk, Feqîyê Teyran, Dîwan, Mirin.

Agahîya Referansê (APA 6):

Aslanoğlu, O. (2026). Di dîwana Feqîyê Teyran da Mirin û Taybetîyên Wê. *Mukaddime, 17(Hejmara Taybet 1)*, 244-261.
<https://doi.org/10.19059/mukaddime.1930122>

Dema Hatina Gotarê: 14.04.2026

Dema Pejirandina Gotarê: 01.05.2026

Destpêk

Mijara mirinê, ji destpêka dîroka mirovahiyê heta îro, yek ji kêşeyên herî kûr û gerdûnî yên hişê mirovî ye. Di gelek şaristanî û pergalên ramanî da, mirin ne tenê wekî dawîya biyolojîk a jiyane, di heman demê da wek diyardeyeke metafîzîkî û felsefî hatiye nîrxandin. Ji felsefeyên kevnar ên Rojhilat heta filozofên Yûnanî yên klasîk, mirov her tim hewl daye ku wateya mirinê fêr bike û cihê wê di çerxa jiyane da diyar bike. Mirinê ewqas di heşê mirovan da cih girtiye ku mirovan gelek adet, çand û kirinên xwe li ser bawerîya mirinê ava kirine. Ji tevgerên rojane bigre heta nêrîna li stêrk û fezayê bi bawerîya mirinê şêl girtiye. Di bawerîyên kevnare ên berî zayînê wek Misir û Mezoptamyayê da tevger û muameleya bo mirîyan jî girêdayî bi rewş û cihê wan a di civakê da cuda bûye. (bnr. Richardson) Di bawerîyên olî da, her çend hûrguliyên li ser mirinê cuda bin jî, xaleke hevpar heye ku mirin wekî "derbasbûnek" e an "guherîna gerdûnê" ye. Lê bi derketina dinên yekxwedayî re, ev têgîn veguherî qonaxeke îmtîhanê û destpêka jiyana ebedî.

Di hizra Îslamî da jî mirin wekî "întîqal" (derbasbûn) û vegera emanetê bo xwediyê wê yê rastîn tê binavkirin. Li gorî zanistên kelmê, mirin ne tinebûn e, lê veqetîna ruh ji bedenê û derbasbûna bo alemê berzaxê ye. Bi mirinê ra di nav ehlê dîn da herî zêde mijara rûh hatiye nîqaşkirin. Rûh namîre, tenê derbas dibe alemek cuda (Gün. rr. 53-55). Ehl-i Sünnet, ruhê wekî cewhereke serbixwe û nemir dihesibîne ku piştî mirinê jî hebûna xwe di alemê berzahê da didomîne. Di tesewufê da ev mijar hîn kûrtir dibe; mirin wekî "şeb-î arus" (şeva dawetê) ango gihîştina evîndar (mirov) bi dildarê xwe yê rastîn (Xwedê) tê ditin. Ev perspektîfa tesewufî, mirinê jî tirseke fîzîkî derdixe û dike mertebeyeke ruhanî ya bilind. Mirin, di vê nêrînê da, ne dawî ye, lê destpêka jiyanê nû û rastîn e ku mirov digihîne heqîqetê. Li alîyê din mirina siruştî yanî tabîî û mirina îradî anî daxwazî heye. Mirina îradî, berîya hatina mirina tabîî, kuştina nefs û daxwazan e, dîrxistina nefsê jî tehmên dinyayê ye (Az, 2020. r. 96; Cebecioğlu, 2014. r. 334).

Ev nêrînên dînî û tesewwûfî bi awayekî kûr û hûr heta dereceya wehdetül-wucûde bi taybet di helbesta klasîk da cihê xwe girtiye. Heta em dikarin bibêjin ku mutesewwîfan, nêrînên ku nikaribûn bi devê xwe êşkere ji xelkê ra bêjin, bi rêya helbestê sergirtî gotine û helbest wek xelasîyek ditine.

Wêjeya cîhanê, bi taybetî wêjeya klasîk a Rojhilatê, mirin wekî temayeke bingehîn girtiye dest. Lewra karê arifan dîrketina ji dinyayê û masîwayê ye. Ji bo vê nêrînê jî herî zêde ji mirinê divê were behskirin. Di wêjeya Erebi, Farisî û Kurdî da, mirin bi nêrînên nêzî hev hatine nîrxandin. Di hemûyan da kêr zêde heman nêzîkayî ya mirinê heye. Carinan bi bêçaretîyê li hember qederê, bi jiyanê demkî û fanî û carinan jî bi şêwazeke didaktîk û hîkmetamîz hatiye hûnandin.

Di helbesta klasîk a Kurdî da wek helbestvanên din ên klasîk, Feqîyê Teyran (1590-1660) jî wekî yek ji stûnên herî giring ên wêjeya klasîk a Kurmancî, di dîwana xwe da bi zimanekî sade lê bi wateyeke kûr behsa mirinê dike. Ji ber ku li ser mijara mirinê ya di helbestên Feqî da xebat nehatine kirin, bi vê xebatê de nêrînên Feqî yên li ser mirinê derkevin holê. Em ê bi teknîka analîza metnan, şeroveya têgehan û lêkolîna mijarî bimeşin. Ji bo vê jî em ê ji navenda mijara mirinê dest pê bikin û ber bi şaxên wê, nêrîn û têgehên têkildar ve herin.

1. Mirin

1.1. Bê Dembûna Mirinê

Kes nizane ku kînga ê bimre. Di lîteratura Îslamî da behsa Muxayyebatê Xemse tê kirin. Yanî pên tiştên ku nayên zanîn. Ev wate di ayeta 34an a Sûreya Loqmanê da derbas dibe (Gündüz ve Seyhan, 2015, r. 268).¹ Di nav wan pênc tiştan da jî yek mirin û Ecel e. Li aliyê din di nêrîna elhê sunnetê da mirin hatiye teqdîrkirin û naguhere (Çelebi, 2021, r. 206-207). Yanî bi hinek tiştan ve girêdayî be jî di dawîyê da dema pêkhatina wê di ilmê Xwede da nivîsandiye. Ji ber wê Feqî dibêje ku mirin herkesî bi xwe ra dibe û qet dem û muhlet jî nade:

Mehbûb û nazik pir hene
Hindî şepal û tuhfê ne
Daîm di ber xemla xwe ne
Bî kes nadet merg muhlete (Feqî, r. 193)

Feqî di heman wateyê da di ristên jêr da dibêje ku her tişt bi destê Xwedê ye, bê wî her tişt bê deng e. Hatîn û çûn, mirin û mayîn hemû bi emrê Xwedê ne, ne di destê mirov da ye:

Ma ez dibêm vê gotinê? Bêy te ziban bêgotin e
Ew qal û qîlê di dinê, zahîr û batin sakîn e
Bûn û mîqata mirinê, Ew'j bal te ne, nej bal min e (Teyran, r. 68)

1.2. Mirin Rastîyê Nîşan Dide

Di hedîsa şerîf da pêxemberê me wiha dibêje: Mirina ku lezzetan tehl dike, pir bînin bîra xwe.” (Yazır, 2017, r. 242) Feqî, bi zimanê keçîka ku Şêxê Sen'an evîndar bû dibêje ku dinya fanî ye, hemû xweşikî demkî ne, xeml û xweşî bê feyde ne, mîsk û kil kirin bê wate ye. Yanî mirov dema heqîqeta dinyayê, fanîbûna wê fehm bike, êdî naxwaze tiştên fanî ra eleqedar bibe û giringîyê bidê:

Paş ku **merg** û mirin hene
Xeml û zînet bêfayde ne
Mîsk û zûbad û surme ne
Çavê di reş kil jê netê (Teyran, r. 193)

1.3. Mirina Ji Evînê

Di tesewwufê da arif lazim e ji her tiştî derbas be û xwe tune bihesibîne. Aşîq û arif çiqas di evînê da kûr bibin, ewqas xwe ji bîr dîkin. Amanca aşîq gihîştina yarê ye û bo vê hemû zehmetîyan dide ber çavan. Rêyeke dûr e û zor e. Aşîq mirinê dide ber çavan. Nêrîna yarê li evîndar, hesret û dûrketina ji wê wek mirinê ye (Pala, 2009, rr. 37-38). Negihîştin jî û gihîştin jî mirina aşîq encam dide. Lewra yek ji derdê negihîştinê dimre, yek jî bi gihîştinê divê xwe tune bike, tenê yara xwe bibîne. Di malikên jêr da muşaaraya bi Mela û Feqî heye. Her du jî bi temsîla êş û birîna ji dûrbûna ji yarê ku dibe sedema mirinê vedibêjin:

Mela
Feryad ji dest fîrçetê, dûr in ji sultan

¹ “Bîrastî zanîna rabûna qiyametê li cem Xwedê ye û baranê Ew dibarîne, ya ku di malzarokan da ye jî Ew pê dizane, qet tu kes nizane ka sibehê ew ê çi qezenc bike û tu kes nizane ew ê li kîjan erdê bimire. Bêguman Xwedê zana û agahdar e.” Loqman 31/34.

Tîrên ji lewnê berqê, heybet û surra xanan
Roj me hatiye şerqê, dê mirîn bi kovanan (Teyran, r. 74)

Feqî
Kovanên ji muhdaran, bê hedd û bê hejmar in
Tîr tên ji wan hîsaran, sed car sed hezar in
Xedengên di nûbaran, nihîn û xef dibarin (Teyran, r. 74)

Feqî
Aşiq bi wesfû medhan, difîrquetê d.i sebir in
Nesîm bêti wan terhan, bilbil xwe jê digirin?
Xwûn da derbitji cerhan, li pêş gul dimirin (Teyran, r. 79)

Nêrînên yarê di edebîyatê da bi tiştên tûj û kujer tên şibandin. Ev bi şibandina bijangên yarê bi tîran û birûyên yarê bi kevanê tên çêkirin. Dema yar li evîndar dinêre bi nêrînên xwe tîrekê di dilê aşiq da dike ku derxistina wê ne pêkan e. Li malikên jêr Feqî vê bandora nêrîna yarê wek derbeyeke çakûçekî ku bizmaran di dilê aşiq da kutaye difikire û dibêje ku ev derbe ewqas giran bûye ku nikare jê bifilite. Ji ber wê mirina xwe di falê da dîtiye:

Bîca ku çû bi bizmaran
Geryame ez li her çaran
Ji min çidkin gelî yaran?
Mirin min diye di falê da (Teyran, r. 221)

Heman wate di malikên din da:

Ji wa qewsa xedeng hatin
Ji wa burca tiving hatin
Li min Rom û Firing hatin
Mirin min di di falê da (Teyran, r. 228)

Di hevpeyvîna Mela û Feqî da jî şibandina agir û pirpirokê hatiye kirin. Pirpirok bi evîna êgir, ji jîyanê tehmê nastîne û xwe davêje êgir û xwe dikuje. Li vir jî bandora evînê ya li ser mirina evîndar xûya ye:

Feqî
Perwane lew dimirit, xweş nîne ev bi jînê
Zeîf e xwe nagirit, tîj e berqa evînê
Di perdê nasebirit, kemala dînê (Teyran, r. 77)

1.4. Mirina Bo Evînê

Di helbesta muşaaireya Mela û Feqî da jî ber hezkirina du hevalan û asta fedakarîya wan bo hev mînakî pirpirokê tê dayîn. Pirpirok jî ber hezkirina ronahîyê xwe feda dike. Fedakarîya can bo canan e ev:

Mela
Şemal eynî nûr e, şewq e li ber sitarê
Perwane bê destûr e, di çerxê semâdarê
Heyran sirra xefûr e, lew canfidayê yarê (Teyran, r. 73)

1.5. Amadekarî Berîya Mirinê

Mirin jêneger e û her nefş rojekê dê bimire. Kes nikare jê bireve. Îro nebe jî rojekê dora me jî tê. Ji ber wê divê însan bo hesabdanê amadekarî bike. Berîya hatina mirinê divê mirov hişyar be ku her dem mirin kare were. Feqî dibêje ku li vê dinyayê kes namîne, ne heval, feqîrekî ji rêzê û n jî serdar, her kes bi dorê dare. Berî hatina dora me jî divê meriv şîyar be, ne di xew da be û tewbe² bike:

Heroj çend car bibê “tewbe”
Di ber hêj ku nehat **newbe**
Dilo hişyar be bê xew be
Ne heval man ne serdar e (Teyran, r. 61)

Mijareke din a giring di tesewwûfê da ew e ku divê ehlê Xwedê berîya mirina beden ji aliyê nefşê da bimire. Yanî nefsa xwe ya dinyewî bikuje. Ji vê ra di tesewwûfê da fena fillah jî tê gotin. Yanî di Xwedê da fanî bûn (Cebecioğlu, 2014, r. 162). Ev dereceya herî bilind a dîlnizmîyê ye. Derwêş xwe biçûk dike, ji her tiştî kêmtir dibîne û bi vî awayî berîya mirinê xwe ji aliyê hestên dinyewî ve dikuşe. Feqî jî dibêje sofî û derwêş dinyayê nafikirin, berîya mirinê dimirin, xwe ji kuçikan û hemû afirandîyan kêmtir dibînin:

Sofî di vê nafikirin
Derwêş di ber mirnê mirin
Dê xwe ji san kêmtir kirin
Bindestê herçî xilqetê (Teyran, r. 106)

1.6. Mirin Bo Herkesî ye

Mirin li ser herkesî hatiye nivîsandin. Jê rev tune. Kesên ji rêzê û belengaz jî dimirin, kesên dewlemend û welî û pêxember jî dimirin. Îmankirî an nekirî ferq nake. Di sûreya Alî İmran, ayeta 185an da Xweda vê rastîyê ji me ra wiha dibêje: “*Her candar dê mirinê biçêje*” (Gündüz, H. û Seyhan, M. r. 185). Feqî di helbesta “Beyta Dilî” da li ser vê dirêj dirêj disekine û gelek kesên dîrok û navdar û gelek pêxemberan rêz dike ku dinya fanî ye û ji van ji kesî ra jî nemaye:

Ne Adem ma û ne Şîş ma
Ne Nûh ma û ne İdrîs ma
Ne Yûnus ma ne Cercîs ma
Ne Eyyûbê brîndar e

Ne Yehya ma ne Salih ma
Ne Harun ma ne Mûsa ma
Ne Meryem ma ne Îsa ma
Ne Ehmed ma ne çaryar e (Teyran, r. 57)

2. Kuştin

Di edebîyata klasîk da mirin bi piranî ji bo rêya yarê, ji bo hezkirina wê an jî di wateya rast û tewessûfî û dînî da mirina bo rêya xwedê tê behskirin. Di helbestên Feqî da jî ew behs jixwe wek dîwanên din gelek in. Lê xemcî mirina bi wî şêklê manewî û evî bi du şêklên din dikare were behskirin. A ewil dîsa mirina bo yarê ye lê bi awayê kuştin

² Li ser girîngîya tewbeyê li van ayetan binêrin: Nûr/31, Tahrîm/8, Beqere/222.

ji destê yarê û a duduyan kuştin û mirina di bûyereke dîrokî û rast da ye. Cureya duyem di her dîwanê da derbas nabe. Lewre helbestvan divê behsa bûyereke dîrokî bike. Feqî wek tê zanîn li ser Kela Dimdimê jî berhemek nivîsandiye û behsa berxwedana Kurdan û kuştina wan, mirina li wir dike. Ev destan xwe dispêre bûyereke dîrokî (Atlı, 2025, r. 413). Ji ber wê ev cureya duyem mirin an kuştina bi destê kesên din di berhemê da heye. Ji ber wê kuştinê em ê wek sernavekî cuda bidin.

2.1. Mirina Pîroz

Di xala ewil da mirina normal hat nîşandan. Di vê xalê da em ê behsa kuştinan bikin. Feqî xencî mirina normal, li ser kuştinan jî disekine. Mirin dema ku normal pêk were tu taybetîyên wê tunene û ew dibe wefat. Jê ra mukafateke manewî ji alîyê dînî ve tune. Lê dema ku mirin, bi hinek şeklan pêk were, wê demê dereceyeke bilind tê hesibandin. Ji wê mirinê ra şehadet te gotin. Di Qur'anê da îşareta li ser vê mirinê heye û pêxember jî li ser gelek rawestîyaye.³

Di hedîsên pêxember a.s. da kesên ku di rêya Xwedê da hatibin kuştin, kesên ku ji nexweşî an musîbetên xwezayî da miribin û kesên ku dema parastina canê xwe miribin, şehîd tê hesibandin. Yanî mirina li dijî êrîşkarên li ser welêt şehadet e. Feqî jî helbesteke 67 malikî li ser şerê Kurdan li dijî êrîşa Safewîyan nivîsandiye. Kurdan li ser çiyayekî keleha Dimdimê çekirine û li wir xwe parastine. Ev şer di sala 1610an da qewimîye (Kaplan, 2023, rr. 1236-1237). Kurdan berxwedaneke mezin nîşan daye û gelek kes mirine. Feqî jî vê mirina pîroz wek têgeha îslamî şehadet bi nav dike:

Bernekirand jê kuştin
Wan ew hemî dikuştin
Qet kesekjê nehiştin
Bûn şehîdê bihişt in (Teyran, r. 143)

Dişa di malikên din da behsa şerê Kela Dimdimê dike ku li her derê ji wan kafirên êrîşkar ra kuştin heye:

Dî dema ji nû ve av e
Li Dimdima çak di nav e
Ev kfire tac zirav e
Bû siwaş û **qetl** û rav e (Teyran, r. 136)

Di helbesta Beyta Dilî da behsa fanîbûn û nerindîya dinyayê, xirabîya nefsê dike û ji bo şîyarbûnê bang dike. Di vê wateyê da îşareta teşxele û kuştin û mirinên dinyayê dike û dibêje ku mirin heye, dinya nasekine û umir derbas dibe:

Biner carek çi bangîn e!
Ji newmê xwe bi hiş bine!
Dinê **qetl** e dinê xwîn e
Dinê gerdûn û rûzgar e (Teyran, r. 51)

Di helbesta Bersîsê Abid da jî şeytan dema Bersîs dixapîne, dibêje ku jixwe dinya wisa kuştin û zîna û şerab e, tu yê tewbe bikî, tişteke namîne, pak dibe:

³ Âl-i İmrân 3/169: "Zinhar tu wan kesên ku di riya Xwedê da hatine kuştin, mirî guman meke! Belkî ew sax in; ji cem Perwerdegarê wan rizqê wan tê dayîn."
"Piştî ku kesek ket bihuştê, naxwaze vegere dinyayê; lê belê şehîd, ji ber wê îkrama mezin a ku ditiye, dixwaze vegere dinyayê û deh caran şehîd bibe."

Qet xem meke dunya we ye
 Beng û zina **qetl** û mey e
 Li wan hemiyan tewbe heye
 Paqij dibin bi tewbetê (Teyran, r. 117)

Di van mînakên jêr da jî behsa kuştina keça ku Şêx jê hez dikir tê kirin:

Reng û ruwê şêx şehitand
 Ew li terîqê xelitand
 Kiç **kuşt** û xûn lê şehitand
 Şer'êji babê diyetê (Teyran, r. 118)

Ebyed. beyan kir gotîne:

“Fisq ûficûr heqê min e
 Mîn pê kirin **qetl** û zina
 Şkîna stûna ‘izzetê (Teyran, r. 120)

3. Fanî Bûn

3.1. Her Tişt Fanî ye

Feqî di helbesta Hûn Werin’da piştî ku bi berfirehî behsa fanîbûna dinyayê û çûna her tiştî kir, di dawîya helbestê da xwe jî tevê dike û dibêje Mîm û Hê be jî her kesî ku ji dayika xwe hatibe dinyayê, Xwedayê aferîner ê wan bişîne alema din, yanî fanî bike. Ev mirin bo her mirovî ye, zatê Xwedê li derveyê vê rêzikê ye. Lewre ew baqî ye, ne fanî ye û nehatiye afirandin. Li vir îşareta ayetên Sûreya Îxlasê jî tê kirin ku tê da behsa bêdayîkbûna Xwedê heye:

Mîm û Hê şairê pak e
 Her kesê bi rûh ji mak e
 Hemîyan Xaliq **fena ke**
 Xeyrî ji Şahê Qudretê (Teyran, r. 49)

Dîsa Feqî li cihekî din dibêje ku tevahîya hebûnê fanî ye, demkî ye, nefsi û beşerî ye. Lê rûh ji bedena maddî cudatir e û eslê rûhê me baqî ye. Lewre wek tê zanîn dema Xweda mirov çêdike ji rûhê xwe pif dike (brn. Aydar, 2025, r. 679–695). Ev mijar di ayetan da jî derbas dibe⁴:

Canê di navê nefsi ye, vêkra hemî bû beşerî
 Maka wicûdan **fanî** ye, er dê bizanî vî derî
 Eslê ruha me baqî ye, lew jê nedakin xawerî (Teyran, r. 69)

Hemû tiştên afirandî fanî ne, bêdewam in, îro hene sibê tunene. Feqî dema bi bilbil ra dipeyîve behsa hezkirina bilbil a mecazî dike. Evîna bilbil dinyewî û fanî ye. Gul sibê diçilmise dare, ne mayînde ye. Ji ber wê dibêje berde van hezkirîyên fanî, dilê xwe bi yareke wisa girêde ku bila nebe fanî. Li vir em karin bêjin ku telmîhek bo gotina Hz. Îbrahîm heye. Wî piştî ku dît stêrk û heyv, roj demek şunda wenda dibin, got: “*Ez ji yê diçe ava hez nakim*” (bnr. En‘âm 6:76):

⁴ Brn. Hicr 15:29; Sad 38:72; Secde 32:9; Enbiya 21:91; Tehrim 66:12.

Feqî dibêji bilbil: “Tu bilbilek sewda yi
‘Îşqa gulê mecaz e, tu yarek bê wefa yî
Dostê ebed bixwaze, da lê nebit **fenayî** (Teyran, r. 84)

Di mînakeke din da dîsa dibêje ku dilê xwe mede fanîyan. Xwe bi fanîyan qirêj meke. Ew gemar dema li me gerîya dernakeve, me jî gemaarî dike:

Ayet dibê “Neqqaş”yek e
Neqşê **fena** ber pê meke
Lubsê ku lê eyb û leke
Qet ew tenî ji dawa te tê (Teyran, r. 169)

Her tişt fanî ye:

Nazika mehbûb ciwanik
Qameta bejna ziravik
Kullu şeyin dibe Halik
Xeyrî ji Şahê Qudretê (Teyran, r. 48)

3.2. Kuştina Nefsê

Feqî dema behsa Şêxê Sen’an dike li ser mezîniya wî ya manewî, mertebeya wî ya bilind dike û dibêje ku qet bala xwe nedida tiştên dinyewî û mecazî. Ew her dem ji kesreta dinyewî dûr bû û nefsa xwe bo daxwazên dinyewî tune kiribû. Li vir fenabûna Şêx wek mirineke nefsi ye:

Ji xeşyetê dil nalenal bû
Umrekî bêhed li bal bû
Rihspî bû şeyb û kal bû
Gişt “**fena**”bû ji “kesret”e (Teyran, r. 153)

4. Feda Kirin

Fedakirin carinan bi can ra, carinan bi rûh ra tê bikaranîn. Feqî di helbesta Bersîsê Abid’da behsa dereceya bilind a wî dike. Dibêje ku qet ranediket, tim li ser îbadetê bû, ne dayik û ne bav, qet nayên bîra wî. Mêrekî canfeda ye, bi sebr û bi xîret e. Li vir ji bo derbasbûna ji canê xwe û dayîna canê xwe bi fedakirinê hatiye gotin:

Qet xew nebû ji tirsaxwuda
Ma kes vi bîr tê bab û da!
Kî mêr e? Mêrê **canfida**
Ê xwarî sebra xîretê (Teyran, r. 98)

Aşiqê nûra Xweda me
Ger bibînim **canfeda** me
Ji bo cemala muhtela me
Kes bi halâ min nezan! (Teyran, r. 208)

5. Felek

5.1. Felek Kujer e

Mirin û cuda bûn û bela û musîbet, her çi hebe di helbestan da sûcdar felek e. Karê wê xirabî, fesadî û kuştin e. Di edebîyatê da her dem ji bo şikayetê tê behskirin û bi awayekî neyînî tê gotin û çî derkeve hember wê dihênciqîne. Evîndaran cuda dike û dike (Aslanoğlu, r. 148, 149). Feqî di vê benda helbesta “Ey felek” da şikayetê ji felekê

dike û behsa cudakirina yara xweşik dike û felekê sebeba vê cudakirin û kuştinê nîşan dide:

Ey felek ey felek!
Te ji min **cuda kir** ew melek
Ew sahîba çavê belek
Ka nazenîna rû bi xal? (Teyran, r. 210)

Felekê yar kuştîye û kiriye axê:

Felekê bê itibar î
Her tu yî mehbûb **veşarî**
Min bi te nine çu yari
Paşê xiyala cubhetê (Teyran, r. 48)

Mela
Perwane lev **disojî**, li lem'eya cezbatê
Fida diket ruh û jî, di keşfa vê suhbatê
Ku da jî nû ve vejî, baqî bit bi heyatê

6. Xak

6.1. Ketina Axê

Mirin dema pêk tê mirov bin axê ra tê spartin û veşartin. Yanî mirin bi xak û axê tê simbolîzekirin. Ji ber wê mecazên ji bo mirinê “ax bûn”, “ketina axê” û tiştên wek van tîrî gotin. Feqî di helbesta “Hûn Werin” da behsa hatina mirinê, cudabûn û wendabûna tiştên xweşik ji dest dike, û fanîbûna dinyayê bi şibandin û şîroveyên balkêş radixe ber çavan. Taybetîyên yara xweşik dibêje û bi mirinê, fanîbûnê dîrketina ji wan û veguherîna axê ya endamên yara xweşik dibêje. Hemû tiştên xweşik, bi mirinê gemarî dibin û dibin ax:

Min heyf li cotê sorgulan
Zulfê muqîrî e li ser milan
Danîne nav **ax** û selan
Êdî bi kê dem ulfetê? (Teyran, r. 48)

Wechê di sor zulfê di zer
Kêm bûn ji wan zêr û zeber
Min heyf li wan **ax** dane ser
Ey felekê bê mirwetê (Teyran, r. 49)

Dê biçîne nîva axekê, perda turabê tarî ye
Feqî dê rakit rahekê, bi mehdera wî Barî ye
Bo çak û pîrîya bi carekê, li cennet bikin serdarî ye (Teyran, r. 69)

Hewara min ji dest qebrê!
Bi ser min da dîkin xebîrê
Ji şerman dê biçim heşîrê
Rehîm û hem tu Rehman î (Teyran, r. 87)

6.2. Ax Dayik e

Her tişt dibe bi umrêkî sînoard e. Dema xwe ku temam dibe dimire û dikeve nav axê û dibe ax. Bi vî awayî ax mîna hmbezekê ye. her tiştî dike hembêza xwe. Wek dayikekê ye. Hembêza xwe ji herkesî ra vedike. Lê ewqas wek dayikekê herkesî hembêz bike jî ser wan digire û wan wenda dike, dikuje. Bi vî awayî ax, dibe dayikeke zalim. Feqî dibêje ev ax, xweşik xuya dike lê zalim e. Kesê baqî berîya ku bimire û bibe ax, divê dev ji dinê berde, dilê xwe pê ve girê nede:

Kesê 'eql e kesê merd e
 Di ber ku hêj nebû erde
 Ji vê meyla xwe jê berde
 Çira ax mak e qehhar e? (Teyran, r. 60)

Dinê mehd e dinê mak e
 Dinê tin e dinê xak e
 Bi ewladan ebed nake
 Ew e bêrehm û dijwar e (Teyran, r. 60)

6.3. Xilasî

Mirov eger bimire û hesab nede, mirin ji bo kesê gunehkar dibe xilasî. Lewra di bawerîya Îslamê da her aqilmend piştî mirinê ê dîsa rabe û hesap bide Xwedê. Lê kesê gunehkar naxwaze lu hesab bide. Ji bo ku ji vî hesabî bireve mirov dixwaze bibe ax û hesab nede û wenda be. Feqî ev rewş bi ayeta Qur'anê⁵ dîyar kiriye ku mirov ji bo ku hesab nede dibêje Xwezî ez bibûma ax:

Gelek sotim kirim kibab
 Kirye bi min sed, rengxirab
 “Ya leytenî kuntu turab”
 Wêran ez im malim xirab (Teyran, r. 198)

7. Qebr-Mezar

7.1. Dikan e

Mirov piştî mirinê dikeve gorê. Gor, her çiqas wek heps û hucreyekê û tunebûnekê were dîtin jî a rast ewder wek dikanekê ye. Feqî bi vê şibandîne dibêje ku mirov her çi bikire wan di dikana xwe da bi cih dike û difroşe û nîşan dide and dibîne. Bi vî awayî her kî çi emelên xweş bike û bi dest xwe, ew ê wan di dikana xwe da yanî di qebra xwe da ê bibîne:

Dibêjin xoce bêdebr e
 Di me'nê da dikan **qabr** e
 Tijî toz e, tijî xebr e
 Qebir teng e, tijî mar e (Teyran, r. 52)

7.2. Cihekî Tirsnak e

Gor, cihekî tarî ye, teng e, kûr e û sar e. Cesedê mirov di wir da tenê dimîne. Mar û morî êrîş dikin. Bi vî awayî jî bedenê mirov ra dibe war û malek. Feqî bi nefsa xwe ra muhasebeyê dike, bo ku terbiye bike qebrê tîne bîra xwe. Mirov bila nebêje ku qebr dûr e, ew der nêzik e û dawîyê da mala dawî ya ku meriv dare ew e:

Tijî mar e, tijî mûr e
 Qewî teng e, qewî kûr e
 Ji xwe **qebrê** mebin dûr e
 Li wê mal e, li vir war e (Teyran, r. 52)

⁵ “Bêguman me hûn ji ezabekî nêzik hişyar kir. Ew roja ku her kes kar û kiryarên xwe dibîne û yê kafir dibêje: Xwezî ez ax û xwelî bûma” Nebe/40.

Ew **meqbera** nav lê **mezar**
 Ew gor û teng û kûr û sar
 Winda kirî sahib kemal
 Ka nazenîna rû bi xal? (Teyran, r. 210)

Zulmeta tarî û kûr e
 Turbeta nav lê **qubûr** e
 Ji enîsan yarî te dûr e
 Qebir bizan nara firqetê (Teyran, r. 48)

Hewara min ji dest **qebrê!**
 Bi ser min da dîkin xebrê
 Ji şerman dê biçim heşrê
 Rehîm û hem tu Rehman î (Teyran, r. 87)

8. Ruh

8.1. Can e

Mirin bi teslîmkirina rûh pêk tê. Fedakirina rûh derbasbûna ji jîyana fanî ye. Dema aşîq bo meşûqê canê xwe dide, ev wek fedakirina rûh tê gotin. Feqî bo vê mînaka pirpirokê dide. Pirpirok rûhê xwe feda dike û ev fedakirin ji ber ku bo yareke baqî ye, ew jî bi vê fedakirinê digêje jîyaneke nû ya baqî. Yanî rûh di rêya Xwedayê baqî da were fedakirin, baqî dibe:

Mela
 Perwane lew disojî, li lem'eya cezbatê
Fida diket ruh û jî, di keşfa vê suhbatê
 Ku da ji nû ve vejî, baqî bit bi heyatê (Teyran, r. 77)

8.2. Zehmetîya RûhDayînê

Mirov gunehkar e û bê rehma Xwedê hesab dayîn zor e. Lewre emela mirovan bo efwa gunehan têrê nake. Mirov divê dua bike ku dema standina rûh, di huzûra Xwedê da bê hêvî neke, Xweda alîkar be. Li vir ji bo mirinê nez' yanî "kişandina rûh" û "rûh dayîn" hatiye gotin:

Ji xeyratan wema umlûs
 "We en leyse liyen-namûs"
 Ji d.îwanê nekî me'yûs!
 Di weqtê **nez'û ruhdanê** (Teyran, r. 86)

Dîsa di helbesteke din da Feqî ji Xwedê rehmet û alîkarîyê bo gunehkarîya xwe dixwaze û wek mînaka din li vir jî di dema kişandina rûh da alîkarîya hêsankirinê dixwaze. Lewre rûh dema tê standin di rîwayetan da tê gotin ku gelek demeke zor e. Lê Xweda kare wê gavê hêsan ke:

Xwedawenda tu sebbûh î
 Dikim sed nal û zûhî
 Di weqtê şiddeta rûhî
 Bi sehlî dê bikey carî! (Teyran, r. 90)

Di helbesta Kela Dimdimê da di çarîna herî dawî da piştî ku bûyera berxwedana Kurdan û şehîtbûna wan kir, ji bo rûhê mirî û kuştîyên Kurdan, Xan û pêxember, ewlîyayan Fatîhayê dixwaze:

Di paşî wan qisan ra
Ji Nebî û ewliyan ra
Ji Mîm û Hê û Xan ra
Fatihe ji rihê wan ra (Teyran, r. 144)

Di helbesta “Ellah Sehergeha Ezel”da çêkirina Xwedê a kaînatê û mirovan bi îradeya xwe tê behskirin. Li vir rûh ji bo mirinê nehatib gotin jî divê were dîtin ka Feqî li ser çi îşaret kiriye. Di van malikan da bi emrê Xwedê afirîna rûhan û kombûna wan li huzûra wî tê gotin. Li vir îşareta mijara “Elestu bi Rabbîkum” heye. Dema Xwedê rûh anîn pêş xwe ji wan pirsibû ku “Ma ez ne Rebbê we me?”:

Emrê te çû ser lefzê “kun”
Mecmûe erwahan ji bin
Anîne dîwana mezin
Ferman te kir wan da xitab (Teyran, r. 92)

8.3. Emanet e

Ev beden, rûh û canê me ji aliyê Xwedê ve hatiye dayîn da ku em bi awayekî rast bikar bînin û dawîyê bi şeklekî xwe bi xwedî teslîm bikin. Di ayeta 72. a sûreya Ehزابê da behsa emenekî tê kirin.⁶ Hinek mufessîr dibêjin ku mebest jê beden û rûhê însên e jî. Dîsa di ayetekê da tê gotin ku li hember Cînnetê Xwedê can û malên mirovan ji wan kiiriye. Yanî canê me an rûhê me bi mukafatekê hatiye kirin, di dest me da emanet e. Bi heman awayî rûh di nav beden da jî wek emanetekî ye. Demek were ê azad bibe. Feqî jî bi heman wateyê dibêje ku her tişt demkî ye, rûhê me jî emanet e:

Dewran qewî dom nakete
Ruhê şêrîn emanet e
Weqtê ecel bê muhlet e
Wê rehm bi mehbûban netê (Teyran, r. 193)

9. Munker û Nekîr

Ev navê du milyaketên mirinê ne ku dema mirovek dimre di qebrê da pirsan dipirsin. Ew melek, azmûna ewil a piştî mirinê ne. Bawerîya bi van melaîkan ji bi nêrîna alîman mecûrî ye (Akçay, 2005, rr. 97-98; brn. Gün, 2025, 70). Ew melek, dema ku mirov dimire pirsên wek “Rebbê te kî ye?, Pêxemberê te kî ye? û Dînê te çi ye? dîkin. Girêdayê bersîvên van mirov dare Cînnet an Cehnimê. Ji ber wê jîyana ebedî a mirovan bi van melaîkeyan ra têkildar e (Güneş, 2018, r. 57).

Behsa van melekên bi piranî ji bo hesabdayîna piştî mirinê tê kirin. Yanî mirov her çi bike, rojekê dema bimore hesab ê jê were pirsîn. Ji ber wê dibê mirov baldar be û xwe ji tiştên xirab dûr xe. Di dîwana Şêx Ferqîr da carekê em derbas dîkin. Di helbestekê da Feqî li ser gunehkarîya însên disekine. Mirov gelek gunehkar e û roja hesab kîtabê û meşerê gelek zor e. Di vî halî da tenê efwa Xwedê xilaskar e. Di qebra tarî da ronîkirina qebrê ji Xwedê tê xwestin. Firişteyên Munker û Nekîr tên ku tiştinan bipirsin. Di wê dema dişwar da Feqî ji Xwedê alîkarî û rêberîyê dixwaze:

Ji zulmatê bibînim fer
Nekîr têtin digel **Munker**

⁶ Me emanetê xwe li asîmanan, li erdê û çîyan derpêş kir, wan xwe neda ber hilgirtina wî (spareyî) û (ji berpirsiya wî) tirsîyan, lê belê însên ew hilgirt. Vêca însên erka xwe pêk neanî, lewra ew birastî sitemkar e, nezan e.

Eya Me'bûd tu yî rehber
Bi heqqê cumle Qur'anê (Teyran, r. 87)

10. Heyata Ebedî, Axîret

Mirov dema dimire, bi bawerîya Îslamê wenda nabe û naçe edemê. Mirin derbasbûna alemêke din e. Ji wê alemê ra ne sînor tine, ne fanî ye. Jîyana wir ebedî û baqî ye. Ji ber wê jê ra heyata ebedî tê gotin. Feqî, di helbesta Şêxê Sen'an da ku ya rast behsa rewşa xwe dike, mirina Şêx û hezkiriya xwe, bi mirinê gihîştina hev û çûna alema ebedî îzah dike. Ew her du bir vî awayî bûne bûk û zavayê axretê:

Di hezreta hev fekkirîn
Li ber surê nasebirîn
Her du bi derdê hev **mirîn**
Li wê gihane **wesletê** (Teyran, r. 196)

Ji hezretê halek wê dî
Her du bi libsê cesedi
Çûne **heyata ebedî**
Zava û bûken **axretê** (Teyran, r. 196)

11. Fîraq - Dûrketin

Mirin tenê bi dayîna nefes dawî nabe. Ji bo evîndaran dûrketin û fîraqa ji yarê, wek mirinê ye, wek agirekî ye ku aşiqan dişewitîne:

Feqî
Fîraqê têk hîrket e, beîd ji ber xiyalê
Tewna ye û zehmet e, bilbil ji ve cemale
Goyîn xew nakete, dîr in ji wîsalê (Teyran, r. 77)

12. Cennet

12.1. Mukafata Mirina Rind

Mirin ne tenê xirabî ye, ne tenê ezab û îşkence ye. Eger emela meriv baş be wê demê gihîştina nîmetan e jî. Xweda di gelek ayetan da vê mizgînîyê dide mu'mîn û misilmanan⁷. Di wê cinnetê da gelek mukafat bo wan hene. Feqî van rêz dike û dibêje ku di Cinnetê da qesr û seray hene, hûrî û xilmanên bê sînor hene:

Biçîne **cenneta nûr** tê
Hizaran qesrê memûr tê
Bê hed xilman û hem hûr tê (Teyran, r. 92)

12.2. Cihê Şehîdan

Di helbesta Kela Dimdim da Feqî behsa kuştîyên Kurdan dike û dibêje ku wan bo dozeke pîroz, bo axa xwe berxwedan kiriye û bûne şehîd û ehlê cenetê. Li vir Feqî mirina pîroz şehadetê û dereceya cenetê bi hev ra dibêje:

Bernekirand jê kuştin
Wan ew hemî dikuştin
Qet kesekjê nehiştin
Bûn şehîdê **bihîşt** in (Teyran, r. 143)

⁷ Bnr. Beqere 2:25; Al-i İmran 3:133; Nisa 4:57; Tewbe 9:72; Muhammed 47:15; Zumer 39:73.

Encam

Di dîwana Feqî da mijara mirinê gelek eşkere ber çavan dikeve. Di gelek helbestan da ji ber ku behsa fanîbûna dinyayê tê kirin û li ser nemayînê, hesabdayînê, tewbe kirinê, gunehkarîyê û daxwaza efwa Xwedê tê rawestandin, pir behsa mirinê, ketina axê û tiştên têkildar hatine gotin. Hema hema di hemû helbestan da ev mijar bi awayekî derdikeve pêş. Lewre nêrîna Feqî ew e ku ev hezkirîyên mecazî, ev dûmenên xweşik hemû demkî ne, divê meriv wisa dilê xwe pêve girênde. Li aliyê din helbesta Kela Dimdimê jî rasterast li ser şer û kuştin û mirinê ye. Ji ber wê li wir jî wek bûyereke dîrokî lê bi temamî li dor mijara mirinê hatiye nivîsandin.

Feqî heman bêje bi awa û amancên cuda lê bi mirinê ra têkildar bikar anîne. Ji ber wê me bikaranînên cuda bi sernavên cuda nîşan dan. Bi vî şeklî xebitandina bêjeyan li ser mijarê xweştir derket holê. Wek encam em karin bêjin ku di mijara mirinê da feqî li ser cudahîyê, mirinê, awayên mirinê, kuştinê, ketina axê, rewşa qebrê, hesab dayîn û jîyana piştî mirinê hemûyan rawestîyaye.

Çavkanî

- Akçay, M. (2005). Gazzali Düşüncesinde Ölüm ve Kabir Hayatı. EKEV Akademi Dergisi, 9(23), 85-102.
- Aslanoğlu, O. (2020). Ruhayî Divan Şiiri Sözlüğü. Ankara: Sonçağ Yayınları.
- Atlı, H. (2025). Destanên Kurdî Ji Aliyê Tema û Mijarên Xwe ve. International Journal of Kurdish Studies, 11(1), 399-422. Doi: <http://dx.doi.org/10.21600/ijoks.1595895>
- Aydar, S. (2025). A General Overview of the Evidence That Ibn Sina Brought From the Qur'an on the Subject of the Soul. Türkiye İlahiyat Araştırmaları Dergisi, 9(2), 679–695.
- Az, M. A. (2017). Fârâbî'de Ruhun Ölümsüzlüğü Meselesi. Turkish Studies, 12(20), 85-100. Doi: <http://dx.doi.org/10.7827/TurkishStudies.12419>
- Cebecioğlu, E. (2014). Tasavvuf Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü. Ankara: Otto Yayınları.
- Çelebi, İ. (2021). İslam'ın İnanç Esasları. İstanbul: İSAM Yayınları.
- Gazali, İ. (1999). Ölüm ve Kıyamet: Ölüm Hazırlığı. İstanbul: Sağlam Yayınları.
- Gün, F. (2025). Kelâm İlmi Açısından Ölüm ve Âhiret İnancı. A. Sinanoğlu & V. Ünverdi (Ed.), Kelam Araştırmaları I içinde (s. 53-74). Ankara: İksad Publishing House.
- Gündüz, H. ve Seyhan, M. (2015). Qur'ana Pîroz Melaweya Kurdî. Ankara: DİB.
- Güneş, K. (2018). Meleklerle İman. Ankara: Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları.
- Kaplan, Y. (2023). Di Temayên Destana Kela Dimdimê da Kurdîniya Îdeal. RumeliDE Dil ve Edebiyat Araştırmaları Dergisi, (34), 1235-1252. Doi: <http://dx.doi.org/10.29000/rumelide.1316386>
- Pala, İ. (2009). Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü. İstanbul: Kapı Yayınları.
- Teyran, F. (2022). Dîwan. Ankara: Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları.
- Yazır, E. H. (2017). Hak Dini Kur'an Dili (Sadeleştiren: H. Döngüren, Cilt 8). İstanbul: Çelik Yayınevi.

Extended Abstract

The concept of death, rebirth, and the afterlife has been a central theme in human thought since the dawn of civilization. Across various cultures and religious systems, death is not merely viewed as a biological end but as a profound metaphysical transition. In Islamic thought, death is often described as *intiqal* (transition) or the return of a trust (*amanah*) to its true owner. Within the Sufi tradition, this perspective is further elevated, transforming the fear of physical cessation into a spiritual milestone known as *shab-i arus* (the wedding night), symbolizing the union of the lover (the human soul) with the Beloved (God). Feqiyê Teyran (1590–1660), a cornerstone of classical Kurdish literature, weaves these theological and mystical threads into his *Divan* with remarkable depth and simplicity. This study explores the multifaceted nature of death in Teyran's poetry, categorizing its various dimensions from the inevitability of the end to the mystical "death before death". Teyran emphasizes that death is an absolute certainty, governed by divine decree (*qadar*). Drawing on the Islamic concept of *Mughayyabat-i Khamsa* (the five unknowns), he notes that no soul knows the time or place of its departure. In his verses, death is depicted as a force that grants no respite, regardless of one's beauty, status, or wealth. He uses the transience of worldly charms—such as musk, kohl, and fine ornaments—to illustrate that the realization of death strips away the illusions of material value. For Teyran, death is the ultimate truth-teller that reveals the vanity of the temporal world (*fana*) and directs the soul toward the eternal (*baqa*). A significant portion of Teyran's work focuses on "death through love." In the Sufi context, the lover must annihilate the self (*fana*) to truly perceive the Beloved. Teyran employs classical metaphors, such as the moth (*parwane*) drawn to the flame, to describe the lover's willingness to sacrifice their existence for spiritual union. He also uses the imagery of the beloved's eyelashes as arrows and eyebrows as bows, suggesting that a single glance from the Divine can "slay" the ego of the seeker. This "voluntary death" (*mawt-i iradi*) involves the suppression of worldly desires and the ego before physical death occurs, a state Teyran describes as being "lower than a dog" in humility, yet spiritually supreme. The physical reality of the grave (*qabr*) serves as a didactic tool in Teyran's poetry. He describes the grave as a "shop" where one displays the "goods" (deeds) acquired during life. While he acknowledges the terrifying aspects of the tomb—its darkness, narrowness, and the presence of serpents—he uses these descriptions to urge the reader toward repentance (*tawba*) and preparation. The grave is not just a pit but a "threshold" to the *Barzakh* (the intermediate realm). Furthermore, Teyran personifies the earth (*khak*) as a "cruel mother" who embraces all her children only to consume them, reinforcing the idea that one should not tether their heart to a world that will eventually bury them. Unlike many of his contemporaries who focused solely on the lyrical or mystical, Teyran also addresses death in historical and narrative contexts. In his account of the Battle of Dimdim Castle, he portrays death as martyrdom (*shahadat*). Here, death is a heroic sacrifice for a sacred cause and the defense of one's land, leading directly to the rewards of Paradise (*Jannat*). Additionally, in narrative poems like *Sheikh San'an* and *Barsise the Ascetic*, he explores death as a consequence of sin, a test of faith, or a final resolution to a life of spiritual struggle. Feqiyê Teyran's treatment of death in his *Divan* is comprehensive, ranging from the biological and historical to the deeply mystical. He utilizes a rich array of Islamic and Sufi symbols—such as the angels *Munkar* and *Nakir*, the concept of the *Amanah* (the soul as a trust), and the metaphors of the moth and the flame—to construct a poetic philosophy of mortality. For Teyran, death is not an end to be feared but a transition to be prepared for, a sacrifice to be embraced in the name of love, and a return to the eternal source of existence. His work remains a profound meditation on the human condition, bridging the gap between the temporal and the divine.